

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



www.arsivakurdi.org

HÊJE MÊJE EMÊ NUHA ÇEND

ÇIROK Û MESELÊN XWE

JI WERE BÊJIN

Kulîlk


Sal: 1989

Çîrok: KAR, GÎSK Û NÊRÎ (3)

Werger: Bavê Hêvî


**Di dawî de Nêrî xwest di ser pirê
derbas bibe û xwe bighîne wê mîrgê
û hevalên xwe.**

**Ew gelekî mezin bû. Riya wî dirêj
bû û Qoçelên wî li hevdu badayî bû.**



**Gava Nêrî xwest di ser pirê derbas
bibe, bû tep û repa wî.**

**Dêw ji bin pirê çeng bû. Ew hingî
nexweşik bû Nêrî jê veriniqî û tu
nema bû di pirê werba. Lê wî xwest
tirsa xwe nedî xuyanîkirin. Wî hîn
bêtir kir tepê rep û rîya xwe do-
mand.**



Bu qêrîna dêw û bankir.

**-Ew kî ye li ser pira min dike tep û
rep?**

Nêrî dengê xwe hin bilind kir û got:

-Ew ez im.



Dêw bi dengekî biling qêrîya:

-Xwe bigre ez hatim te. Te bi kude xelas bibe. Ezê te perçe perçe bikim.

Nêrî lê wegerand:

-Hela were bê kî, kê perçe dike.

(Dumahik heye)



DELALÊ

**Delala min çûye avê,
Kilê çava xiste navê,
Tev û cila dide navê
Cil şil bûne, davê tavê.
Delala min çû bêrîyê
Hişê wê li ser berîyê
Şîr rijîya nav herîyê.
Dîs ji tirsa damarîyê.**


**Delala min gulîstane,
Li nav dilê Kurdistanê,
Kurdistan li ber destane,
Çawa bê sebra kurdane...**

**Delal hê li ber derdane
Pir dikşîne van kulane
Fedî bikin ji gelan'e
Çi temara we mîrane...**

Kurdistan- 1987

Şaxê Ciwan

VAN HEJMARAN Yeko Yeko BIGHININ HEV



GRAMOFONA APÊ QADO

Apê Qado merovekî jîr û zana bû. Di dema wî de, arebe pir kêm bû û gelek însan xweşikî neçûbûn tu bajaran.

Lê apê Qado ne wiha bû. Wî gelek bajar dîtibû, heta ew gelek caran çûbû paytextên Tir-kî Ankara jî.

Carekê gava apê Qado dihere Ankara, ew Gramofonê cara yekem li wir dibîne û gramafonekê dikire. Gava apê Qado vedigere gundê xwe, berî di nav gund keve, gramafona xwe li ser kerekê dijdîne û ew hinekî ji durve dide dû kerê û dimeşe, şivan, gavan û beriwan dinerin, wa kerek ji wêde tê û distrê.

Rebena cara yekem li tişkî wiha rast têن û her yek bi alîkî direvin û dîkin gazî:

-Hewarê tercal rabû, hewarê tercal rabû.

PîRO



QUNCIKA TARÎXA EDEBYATA KURDÎ

Pertew- Begê Hekarî (XVIII)

Di sala 1976 da li bajarê Bexdadê zanyarê kurd Sadiq Bahadîrê navdar dîwana pertew begê Hekarî çap kir. Dîwan ji destnîsara tîpên erebî hatîye hâzirkirn û çapkiran. Di pêşgotina xwe da ya di kitêba "Dîwana pertewbegê Hekarî" da sadiq Bahadîn Ama-dî nivîsiye, ku tarixnas û edebyatnasên kurd tiştekî zelal û ronî derheqa pertew- Beg da nenivîsinin, Ser-hatîya wî ne aşîkare. Hew nivîsîne, ku ewî dîwana xwe di sala 1221 hicrî (1802) da nivîsiye.

Sadiq Behadîn amedî wusan jî li pêşgotina xwe da dinivîse, ku carapêşîn hinek xezalêt bertew- beg Hekarî di kovara "Dengê Gitî teze" da di hejmarên 3,4,5 yên di sala 1944-an da hatinin çapkiran... Dîsa gorî Sadiq Behadîn, du hebetên pertew-beg di kitîba "Dîwana kurmancî" da hatinin çapkiran. Se-çar xezal û xweşxanên wî ji di kovara "Nuserî kurd" da di N 2 da sala 1971 hatinin çapkiran.

(Dûmahîk heye)

QUNCIKA XÊZIKAN



ZILAM GUR BERX Û LEHANE

Zilamek li ber çemekî ye û dixwazê derbasî alîyê din bibe. Lê bi wî re gurek, berxek û seryakî Lehane heye. Kelekek bi çuk li ber çem e û hew dikare du tişt pê derbasî alîyê din bibe. Ger ew zilama pêşî gur derbas bike, wê berx lehanê bixwe, serîyê lehanê derbas bike, wê gavê ewê gur berxê bixwe.

Ma hûn dizanin wê ew zilam wan çawa derbas bike?



QUNCIKA BAJARÊN KURDISTANÊ


Bingol (Çapaxçûr) (2)

Golên mezin li vê herêmê tunene. Çend go-lên biçûk hene. Navê wan; Gola Kerkîs, gola Zilir, gola Sar, gola Çûk û gola Biberîn.

Derdora Çapaxçûrê bi piranî avî ye. Berf û baran gelek dibare. Ji ber vê yekê jî daristan cîhekî girîng digre. Ji sedî 12 yê herêmê daristan e.

HEWA: Çapaxçûrê havînan gelek germ û zifistanan jî gelek sar e. Ev jî, ji ber bilindîya vê herêmê ye. Mehêñ temûz û tebaxê gelek germin. Baran bi piranî di biharê de dibare. Li vê dorê bayê bakur (bayêkur) bi zêdeyî tê dîtin.

Axa Çapaxçûrê ji bo çandinyê pir bi kêr nayê. Lewra çîya gelekin. Çandinî yên tê ki-



rin jî, genim, ceh û garis in. Li hinek çîhan jî fasûlî û nîsk têñ çandin.

Lê çan û rexê Çapaxçûrê ji bo xwedîkirina heywana pirbi kêr e. Aborîya roniştvanê vir ji sedî 77 (%77) li ser heywanaye. Jîyana wan bi kirîn û frotina heywana ve girêdayî ye.

Daristan jî, ji bo merovên wir gelek girîng in. Piraniya daristanan ji darêñ mazî pêk têñ. Li hemû Kurdîstanê û Tirkîyê jî daristanêñ bi vî rengî peyda na be.

Li vê herêmê mirov nikare bahsa dezgeh (industrîyê) bike. Tu karxane (fabriqe) tune ye. Daristanêñ vê derdorê li kîja deverêñ din bûna, wê bi kêmasî karxanak kaxeza li wê bi-hata çêkirin. Lê ne hikûmeta Tirkî û ne jî ser-mayedarêñ tirka naxwazin tu karxana û projên mezin li Kurdîstanê çê bikin.

Ji alîyê madenê bin erdê jî, ev herêm gelek dewlemend e. Li Karliova komir, li Gencê hesin û li Kixî jî Sifir (Bakir) heye.

(Dûmahîk heye)

MIJÛLÎ



**Di nav herdu resman de 5 tişt newekhevin ma hûn
dikarin wan bibînin**

LÎSTIKÊN ZAROWAN

Beşîr Botanî

1

Em dijmêrin yek dû sê
Niha dema piya sê
Werin da em bilîzin
Mêw mêt, mêt mêt, mêt mêt


Em dijmêrin çar pênc şes
Civîna me bûya geş
Werin da em bistirin
Lale, lale, lala

Em dijmêrin heft heşt neh
Niho em gehîştin deh
Werin da em bikenin
Ha he, hahe, haha

2

**Her heftiyekê heft roj in
Hevalan! Werin bijmêrin
Roja Yekşemî
Roja dûşemî
Roja sêşemî
Roja Çarşemî
Roja pêncşemî
Roja Înî û roja şemî
Bi Xoşîyê bijîn hemî**

QUNCİKA MATAMATİKÊ



$15 + 15 = \underline{\hspace{2cm}}$

$37 + 17 = \underline{\hspace{2cm}}$

$15 + 16 = \underline{\hspace{2cm}}$

$66 + 15 = \underline{\hspace{2cm}}$

$17 + 17 = \underline{\hspace{2cm}}$

$58 + 18 = \underline{\hspace{2cm}}$

$17 + 18 = \underline{\hspace{2cm}}$

$46 + 17 = \underline{\hspace{2cm}}$

$18 + 17 = \underline{\hspace{2cm}}$

$77 + 18 = \underline{\hspace{2cm}}$

$16 + 16 = \underline{\hspace{2cm}}$

$55 + 15 = \underline{\hspace{2cm}}$

$16 + 17 = \underline{\hspace{2cm}}$

$37 + 16 = \underline{\hspace{2cm}}$

$17 + 16 = \underline{\hspace{2cm}}$

$68 + 17 = \underline{\hspace{2cm}}$

$18 + 18 = \underline{\hspace{2cm}}$

$46 + 15 = \underline{\hspace{2cm}}$

$18 + 17 = \underline{\hspace{2cm}}$

$76 + 16 = \underline{\hspace{2cm}}$

DOSTÊ ÎNSANAN, KEVOK - 1 -

Gorî di tewratê de hatîye nivîsandin, nebî Nûh kevokek sipî fiandîye ji jbo bizanibe, ku tofan rawestîya ye an na. Piştî demekê kevok dargulikek dara zeytûnê di nav nikilê wê de vedigere gemîyê (keşti). Bi wî awayî dizanin, ku av dahatîye û tofan rawestîya ye.

Ji wê rojê û virde, kevok bûnin nîşana aştî û evînî ye.

Li ser rûyê erdê Qasî 80 milyon kevok dijîn. Di sala 1824-an de çûknasên fransî Boitard û Carbie daxyanî kirin, ku 122 şiklên kevokan hene.

Ji demêñ berê de kevokan her gav nêzîkatî û dostanîya însanan kirinin. Lê sedemêñ vî tiştî heta îro nehatîye zanîn.

Kevok gelek sipehî ye û li hemberî xwedîyê xwe bi bext in.

Kevokêñ mê 17-18 rojan kurk dikevin û rojê li derdora 20 seetan li ser hêkêñ xwe dimînnin. Kevokêñ nêr jî kêmzêde 4 seetan şûna kevokêñ mê digarin û ew li ser hêkan dimînnin.

Hinek kevok henin, ew dikarin heta 1000-1500 metran bilind bifirin. Qasî tê zanîn, kevok jî wek gelek çûkêñ din ji 140 milyon salan û virde dijîn.


Di pirtûkêñ Olî de, cara yekem navê kevokan di tewratê de derbas dibe. Berî îsa, ya-hûdîyan ji bo gunehêñ xwe bide bexşandin kevok dikirîn û dikirin Qurban. Lê gava însanan ji xwedakî tenê bawerkirin û virde, kew bû nîşana evînî ye û bû xwedî rûmetek taybetî.

(Dumahîk heye)

XAÇEPIRS



6




1




3



5



4



1)Vî alî gelî, wî alî gelî
Ortê da şûrekî şîn.
Ew çiye?

2)Vî alî dîwar, wî alî dîwar
Ortêda girêdaye seyekî har,
Ew çiye?


3)Odeka şuştî-muştî
Çil feqîr têda rûniştî
Ew çiye?

4)Vî alî aş, wî alî aş
Ortêda topê qumaş
Ew çiye?

BERSİVA XAÇEPIRSAN



2.




1.



4.



5.



6.



3.

BERSÎVA PÊZANÎNAN

Pirs: 1

**Tişkî min heye tiştanok,
Dinya hemû têdaye.**

Ew çîye?

Bersîv: Guh

Pirs: 2

**Kanîya qinê-qinê,
Mîr û hakîm dest didinê.**

Ew çîye?

Bersîv: Poz

Pirs: 3

**Divêm «were were»nayê,
Divêm «Meyê, meyê» tê.**

Ew çîye?

Bersîv: Lîv


KEREKÎ ME HEBÛ Û KUNDIRKÎ ME

KERÊ ME KUNDIRÊ ME KOT KOT KOT

ME JÎ ÇIROK Û MESELÊ XWE

YÊN VÊ HIJMARÊ JI WERE GOT

Kulîlk





YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA CANDA KARKERÊN KURDISTANE

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA